Qêrên ketye canê min

Di / 12 / 9 / 2023an de bi xemgînî me nûçeya koçkirina hunemendê kurd "Beytocan" bihîst.
Hunermend "Beytocan" yek ji wan kesên ku xizmeteke mezin ji hunera kurdî re pêşkêş kiriye û di rêveçûna jiyana xwe ya huneriyê de Çar elbûm weşandine.
Ew di sala 1955an de li navçeya Farqînê ya Amedê li Kurdistana Bakur ji dayikbûye , ji ber xebata xwe ya netewî di dawiya sala 1980 de hatiye girtin û Pazde salan cezayê girtîgehê lê hatiye birîn û di zîndanê de maye , piştre di sala 1987an de hatiye berdan.
Wî di rêveçûna xwe ya hunerî de semyanek mezin ji hunera kurdî re li pey xwe hişt.
Beytocan demeke dirêj ji ber nexweşiya penceşêrê di êş û azariyê de dijî û di berbanga vê rojê koça dawî kir.
Bi navê nivîsgeha ragihandina navendî ya "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" em dibêjin :
Bila serê gelê kurd sax be
Beytocan namire wê herdem di nav hunera kurdî de bijî

12 / 9 / 2026 Z - 2638 K

Nivîsgeha Ragihandina Navendî ya
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

Diyarî ji bo xwendevanan

Pêşverû

Parçeyek ji bersiva Hoşeng

Xwendevanên hêja
Di vê hejmarê de emê parçeyekê ji bersiva Hoşeng diyarî we bikin , Apê Osman Dema kurê wî Hoşeng nameyekê jê re dişîne û amaje dide gotinên xelkê ku Xwedêgiravî bavê wî ji xebatê sar û bêhêvî bûye, kela dilê Osman Sebrî gurr dibe û ji ber derew û neheqiya xirabkaran Apê me wiha Bersiva Hoşeng dide:

"Delal: Gava em ne çak û dirust bin. Teqez ew ji pîsî û neqenciya me ye. Em çawa dikarin bêjin "Sûcê felek û koledar tê heye?" Ma heya çi gavê em dê ji sûc û gunehên xwe birevin?
Riya rast berdin, bikevin xaçerêyan, deverû bikevin.
Riya rast şemirandin ne karê camêran e; teqez qelsî ye.
Ji gunehên xwe revîn karê nemerdan e, bes pîsî ye. Ji bo çi holê em pîsiyê di xwe de tînin?
Neyar û nemerdan dilgeş dikin, bi xwe dikenînin.
Ev yek bûye nexweşiyek malkambax ketiye canê me.
Wey xwelî li serê me, me riya rast şemirand.
Gelo! Ma em dê çawa xwe ji vê nexweşiyê xilas kin?
Gunehên xwe bibînin, qencî û neqenciyê ji hev nas kin?
Guh bide min, delal!
Ez sond dixwim bi serê te û Hoşîn û Heval.
Ku tu caran ji xwe û gel bêhêvî nebûme.
Li ser şopa qelsan nehatime û tê neçûme. Ji lew re diviyabû ji her kirê hûr bim.
Xwe ragirim, ji her kesî dûr bim.
Heya rastî ji her kesî ve xuya be.
Qencî û neqencî ji hev cuda be."

(Osman Sebrî 1977)

Bavê Zozanê : Bejn û bala strana kurdî ya nûjen

Piraniya stranên kurdî eger ne hemî bi rêk û pêk hatine ristin, xweş, hesan û sivik in,ji xwere mere li ser dev û lêvan dihelin .
Qam û qilafeta strana Kurdî tê xuyanîkirin ku ew êşa zor û giran ,tevlî kar û barê jiyana dijwar ku bi rengekî zelal û hesanî ji guhdarê xwe re vediguhast .
Wisa jî tevlî wî folklorê dewlemend ku wisa bi xweşî pêşberî milet radixst bi hemî reng û coreyên xwe ve :Dîlok,lawik, heyranok ,dengbêjê,şîn û sema … Bê rawestandin û bê ti awayê çêkirinê.
Qam û qilafeta strana Kurdî di wê rastiyê de ye ku ew ne ji bo kêfê hatiye gotin an nivîsandin , lê ji bo ku milet di serdema bêdewletbûnê de, bê televîzyon û tewra bê dibistanê de xwe ji bîr nekin, ew di her warî de celebek ji berxwedana nerm tê jimartin.
Qam û qilafeta strana Kurdî di dengê çiyê de tê xuyanîkirin ,di dengê dêya ku li benda lawikê xwe ye, tê xuyanîkirin di dengê wê erda ku hîn kesî ew qebûl nekiriye tê xuyanîkirin ji vê jî tu bi giraniya êşa di stranê de dihise tevlî ku em semayê li ber dikin.
Ji vê jî ew ne hewcê ti simfoniyê ye , yan jî alavê mûzîkê yên giran e ,bi qasî ku tenê tembûr ya zirne û daholençax ew karibin agirê şewata dilê dayikên kurdan yan jî kul û derdê zîn a birîndar vemrîn in.
Deka em bi hev re vê strana naz û delal bixwênin û şirove bikin ku ji awaz û gotinê mamosta Besam ê Reşo ye,û bi dengê hunermend ê navdar Mistefa Xalid stran hatiya naskirin û belavkirin ,dive ku hinên din jî starndibin mîna hunermend: Melek , û Mihemed Husên….
Bi çi navî ez bankim
Bi çi navî ez bankim ez mam heyirî bi te re
Navê gulan li te nakim ti ji gulan xweşik ti re
Kevokê ez bang te nakim ez ditirsim ti rojekê bifire
Ezê dinê xirakim ku ji destê min tu herê
Kûdera te ez maçbikim ji kûderê dest pêbikim
Riya memika nasbikim bawerke ez nasekinim
Xweda ditirsim xwe şaş bikim rojiya xwe vekim
Ezê dilê xwe qurbankim hew xwe dûrî te dikim
Ji lêvên tey nazik hingiv maçek ji xwer dizî
Ew heyva bi nav û deng xwe feşart û vedizî
Gulên bi hilim û bi reng ji qehra mir û çilmisî
Wek bedewbûna te yar xweda nedaye kesî
Nêrînek rexneyî li helbestê:
Helbest bi awakî nerm hatiye nivîsandin û bi awakî ji şekir şêrîn tir hatiye awaz kirin. Ew ji stranên Derd û evînê tê jimartin.

1. Mijar û raman:

Ramana sereke di helbestê de têkçûyî û tirsa windabûnê ye.
Helbestvan li ber evînekê rawestiyaye û nizanî bi çi navî wê bange. Çimkî her nav kêm e li ber bedewî û mezinahiya wê.
Ez mam heyirî: Ez di navbera evîn û tirsê de asê mam. Ev rewşa mirovê ku ji evînê ditirse ku wê winda bike.

2. Wêne û Sembolên wêjeyî :

-Navê gulan li te nakim:Gul pir xweşik in, lê tu ji gulan jî xweşiktir î. Helbestvan her tiştî red dike ji ber ku evîndar î ji her tiştî bilindtir e.
-Kevokê ez bang te nakim ez ditirsim ti rojekê bifire.Kevok di çanda kurdan de sembola aşîtî û evîndariyê ye wisa jî nîşana dilovanî û azadiyê ye. Lê tirs heye,eger ku bang bike dibe ku bifire û here.
-Ezê dinê xirakim ku ji destê min tu herê
Mezintirîn tirsa helbestvan Windakirina evîndariyê ye ku wek xirabûna cîhanê ye li nik wî tê naskirin.
-Kûdera te ez maçbikim ji kûderê dest pêbikim : Helbestvan di nav bedewiyê de winda bûye. Nizanî dest bi ku derê bike.
-Ew heyva bi nav û deng xwe feşart û vedizî
Evîndarî yan jî sipehîbûna yarê wek heyvê ye. Lê heyvê jî li ber bedewiya wê şerm kir û xwe veşart. Danasîn û wêneyek pir xweşik û berfireh e nexasim gotina vedizî ku li du xweveşart hat ew bitir bi cih kir, şarezebûna helbestvan bê pilan li nik guhdêr berz dike .

3. Ziman û Şêwaz :

1. Dubarekirin:Ez,te,ezê gelek tên dubarekirin. Ev derd û obsêsiyona-Girêdana zêde- a helbestvan bi yarê re nîşan dide.
2. Pirs û bersiv :Ji kûderê dest pêbikim ,Bi çi navî,Helbest bi pirsan tije ye. Çimkî li nik helbestvan bersiv nîne.
3. Sadehî : Ziman pir sade ye. Peyvên wek gulan, kevok, hingiv, heyv, gul, peyvên rojane ne. Lê bi hev re wêneyên kûr didin.
4. Mûzîka hundirîn: Rîtm ji qafiya kêm tê: heyirî – xweşikî – bifire – herê. Ev dengê tîban dişibe giriyê mirovan wek ku tîpa dawî digrî wisa bi êş hatiye.
5. Hest û Atmosfêr:
Atmosfêra helbestê şîn, tirs û hezkirinê hembêz dike .
Helbestvan ne tenê evîndar e, ew mirovê ku ji mezinahiya evînê ditirse.
Wek mirovekî li ber deryayekê rawestiya ye û ditirse ku dinav de noq bibe , bi xeniqe.
Malika herî bi hêz: Xweda ditirsim xwe şaş bikim rojiya xwe vekim.
Tirsa herî mezin ew e ku xwe di evînê de winda bikî. Ji ber vê yekê helbestvan dixwaze bêdeng bimîne.
6.Encam :
Ev helbest ne tenê stranek evînê ye. Ew dua ye jî.
Duaya mirovê ku tiştekî pir pîroz dîtiye û ditirse ku destê xwe lê bide û xira bibe.
Cewhera helbestê di vê hevokê de ye: Ezê dilê xwe qurbankim hew xwe dûrî te dikim.
Helbestvan dibêje ji bo parastina te, ez ê xwe ji te dûr bikim xwe bikujim .Ev lûtika herî bilinde di dualîtiya evîn û qurbaniyê de .

Dawî:

Strana Kurdî ne tenê mûzîk e belê dîroka miletekî ye, bîranîn û hişmendiya niştimanî ya gel diparêzê.

Nivîskar : Bavê Zozanê

Dûmahî : Dr.Ebdilmecît Şêxo : Xwendinek di çar berhevokên Husên M.Hebeş de

Dagîr kiribû.
Baran ji zû ve nebariye!
Asîmano tu çiqasî
Çav teng î ! Rûpel:(38)
Êrê helbestvan gil û gazinan ji sûriştê jî dike,ku çima ewa bi ava xwe bejnên darên welatê min naşo?Helbestvan pir ji dagîrkeran bêhnteng dibe,ew mîna her niştimanperwerekî dilsoz rewşa navçeya xwe dişopîne,ew rind jî zane ku zeviyên darên zêtunê bi destên biyaniyên riçperest gemarî bûne,lê baranê jî ew hîn neşuştine, lewra jî ew gilûgazinan ji Ezmên dike û bi van peyvên sanahî hestên xwe li tevnê dixe.
Darek xemgîn bû
Tozê pelên wê yên kesk û xweşik
Salt
Dagîr kiribû
Baran ji zû ve nebariye!
Asîman tu çiqasî
Çavteng î ! Rûpel.(38)
Dîsan H. M. Hebeş bi hestên tenik û bi sanahî xwe têper û derbazî hundirê dilê darekê dike,rûpelên bîranên wê dixwîne û bi guhên baş nalîna wê jî dibhîse, erê! Ristevan bi evîn û rêzdariya xwe ji darê re,hêştiye ku giyana darê jî peyvdar be û bi dil û can pakrewanekî hembêz dike .
Gava ji darekê
Darbestek çêkirin
Dar pir êşiya û xemgîn bû.
Lê gava termê
Şehîdekî tê de dirêj kirin
Kenekî xweş
Li ser rûyê wê xuya kir
…….). Rrûpel (46)
Helbestvan bi hezkirin û bi dilgermî li daran temaşe dike,ew rûpelên dilên wan rast dixwîne,ew bi hest dengê darê dibhîse ku çiqas ewa bi hebûna xwe serbilind e,lewra ew li cihê xwe dimîne û naçe cem Buharê lê Buhar tête cem wê û pelên pîkên wê mezin û ciwan dibin,lewra ewa dixwaze ji mirovên xwe re bibe cihê parastinê û bang li mirovekî dike û dibêje:Were bi lez were!
Mirovek ji leşkeran deriviya
Darekê ew dît
Pê re got:Were bi lez were!
Xwe di nav pelên min de veşêre ! Rûpel(56)
Çiqas helbestvan xwe bi germî û bi diltenikî nêzîkî can û giyanê darê dike,ewqas jî ew dikane naverokên rûpelên wê yên mirovperwerî jî bixwîne, bi wê re bipeyve û stêrên çavên wê ji bo zarokên belengaz û xizan bi ramûsanên xwe vexwe,lê tenha xwe jî bila ew li ber alafên agirê min xwe ji sermê û nexweşiyê biparêzin.
Darê bi darbir re got:
Te ez birandim
Û hemû tişt qediya!
Lê hêviyekê ji te dikim
Ku tu êzingên min
Bidî maleke xizan !
Da ku zarokên wê malê
Xwe li ber agirê min
Germ bikin ! Rûpel:(60)
Bi rastî her ku ez helbesteke H. Hebeş dixwînim ,bê vîna min helbestvanê Kurdistanî Şêrko Bêkes û helbestên wî yên kin,zelal û watedar têtin bîra min,tu dibêjî qey ew bi zerkeke gundiyê Şiyê ava kaniyê Sulêmaniyê vedixwe. Şêrko Bêkes jî pir caran bi kurte-helbestên xwe bi peyvên sanahî û bi wateyên pir rakêş pêşkeşî xwendevanên xwe dike,em bi hev re vê kurte-helbestê mîna nimûneyekê bixwînin.
Pregnancy & Maternity
Di bin baranê de
Helbest dibe çetir
Di bin germa rojê de
Helbest dibe sîber
Di sermayê de
Helbest dibe agir û li şewa tarî de dibe çira riya te
Çi dema çetir,sîber,agir û çirayê min cem te nebûn.
Wê yekê bizane
Êdê helbest çûye ava û ez jî mirim e.
Çiqas helbestvan li ser dipeyve, germbûna dilê wî sar nabe,ew hercarê bi hestek nûh wêneyek nûh di helbesta xwe nîger dik, xûya ye ristvan hest û mestên xwe bi ba û avên kanîyên bajarê xwe,bajararê zêtunan baş avdane,binêrin çawa ew dihêle darên Efrînê dîlanê ji nişteciyên xwe re bigerînin .
Darê zeytûnê
Li ser rêzekê ne
Bi dilekî germ bavê min
Bi min re dibêje:
Lawê min binêre !
Li van keçikên şêrîn binêre!
Çiqas dîlaneke xweş digerînin.
Herdîsan hêrs û kelha dilê helbestvanê me bi helbestekê danetê,eger li nik hemû niştimanperwerên cîhanê ,dayika mezin welat e û welat jî dayîk e,lê dayika me jî ne tenê neh zarokên xwe hene ,ewa tekez dike ku ya rastir hezar û neh zarokên xwehene,ew carekê din dixwaze bike qêrîn û bi nalîn ji cîhana rûreş re bêje:Binêrin çawa neyarên me darên me bêdilovanî dikujin li pêş çavên dayikên xwe bi destên hin gurên devbixwîn têtin darvekirin .
Ji dayikekê pirskirin
Arabs & Middle Easterners
Çend zarokên te hene
Got:Neh û tiliya xwe
Ber bi ziviyêên zeytunan ve
Dirêj kir û got:
Na! Ya rast hezar û neh
Zarokên min
hene. Rûpel (67)
Herwisa jî helbestvan bi hestên daran re hevpar e û ew baş li ser pelên daran dixwîne û pîkên darên zêtunê bi helbestvan re dipeyivin û dengê nalîna xwe di guhên helbestvan de dengvedidin ,ew nikanin di nav axa biyaniyan de û di ber ba û hilmên neyarên xwedanên xwe de bijîn ,em binêrin çiqas helbestvan bi hêsanî dengê dara Çiyayê Kurmênc bi me dide bihîstin.
Darek hilkirin
Û birin li baxçeyekî çandin
Pir xemgîn bû!
Salt
Û got:Dixwazim herim
Bal dayika xwe Darisrtanê. Rûpel:(79).
Herweha dîsan gelek kurte-helbestên din balkêş û pir watdar hene;(Hevgirtin),(Berhevkirin), (Nirx!),(Dar û Çivîk),(Dar û Şer!),(Tu û daristan). Û.W.D.

Dr.Ebdilmecît Şêxo : Xwendinek di çar berhevokên Husên M.Hebeş de

Di nêrîna min de baştir e ku em helbestvan bi kurtî di çend rêzikan de bidin nasîn:H.M. Hebeş di sala 1970 de li gundê Şiyê,gundê helbestvanê nemir Hamid Bedirxan li navçeya Efrînê, Rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye.Ew jî mînanî pir hemwelatiyên Rojavayê Kurdistanê ji ber zor û setemên rêjîma dewleta Sûriyê ya xwînvexwar di sala 1996 an de koçberî Almaniya dibe û ew ta niha jî bi helbestên xwe re mîna balindekî azad li Bonê dîj û li ezmanên pir welatên cîhanê bi serbilindî difire.

Husên M.Hebeş di destpêkê de helbestên xwe bi zimanê Erebî dinivîsand,lê ew zû têgihîşt;ne rewa ye ku ew zimanê dayika xwe,zimanê Ehmedê Xanî û Mem Zînê bi zimanekî biyanî biguhêre,ew baş şehrezabû ku pêyvên Kurdî jî kanin giyanê berdin hest û mestên wî û hin nêrînên din cida pûç bikin.

Niha weha helbest mîna ava kaniya Şiyê û mîna avên pir kaniyên gundên Efrînê gelek zelal û watedar ji hestên wî diherikin,ewî jî mînanî pir wêjevanên Kurdistanê xwe li hember gel û zimanê dayika xwe berpirsiyar dibîn e.

Helbestên Husên M.Hebeş bi zimanên biyanî sînorên Kurdistanê derbaz dikin û ew ne tenê balyozxana helbesta kurdî li welatekî biyanî ye,lê ew balyoza helbesta Kurdî li pir welatên biyanî ye,ez dikanim bêjim ew bûye balyozxana helbesta Kurdî li welatên biyanî, ew bi pir zimanên din biyanî li mîhrecanên cîhanî(kolombiya, Nîkaragoo,Almaniya,Firansa,Kosofo,Çîn û li pir welatên din têtin xwendin,ango helbestvan ta sala 2019 an da li sî û sê mîhrecanên navdewletî bi helbestên xwe hevpar bûye.

Min ta niha û pir mixabin tenê çar berhevokên helbestvan xwendine1- Darên Sermest,sal:2020.2-Bêzariya Peykerekî Westîyayî.Sal:2021.3-Jibîrkirin.Sal:2025.4-Taya Bîhokan.sal:?

-Erê !Ne hêsan û sanahî ye ku tu bibî helbestvanekî nayabdar.

– Ne hêsan e tu bibî helbestvanekî welatparêz.

-Ne hêsan e tu bibî dengvedana gelê xwe li cîhanê .

1-Ne hêsan e nalîna gelê te di guhên biyaniyan de mîna zengilan lêkeve û ne hêsan e jî, dilên çelmmisî bi peyvên watedar werin vejandin.

Na!Na!Lê em li nik helbestvan Husên M.Hebeş pir sanahî dibînin,helbestvan hemû hestên xwe bêwestandin dugvêşe,ew dikane pir caran bêbasik di nav dar û zeviyên welatê xwe de bifire,ew dikane bi xwe re bikene û bidegrî,ew dikane giyanê berde xewnên şiyarbûnê.

Helbestvan dikane bi hêsanî ji hîmekê nivîneke nerm ji xwe re ava bike,ji kevirekî balîvekê ji hêriyê çêke û ji siya dareke Zêtunê maleke ciwan ji penaberan re ava bike,ew dikane hişên xwendevanên xwe bi duşava helbestên xwe avde.

Erê!Helbestvan ne yasemend e,ew pir bi sanahî sînorên civakî derbaz dike,ew ne mînanî siyasetmedarên serdemê ne,ewên ne herdem kanin yên dilên di xwe de bi sanahî sercil bikin.

xxxxxx

Em di vê kurtexwendinê de li nik çar berhevokên helbestvan Husên M. Hebeş radiwestin,lê Husên H.Hebeş kî ye??

H.M.Hebeş di sala 1970 î de li gundê Şiyê li Çiyayê Kurmênc,gundê helbestvanê navdar û nemir Hamid BedirXan ji dayik bûye,ew ji dawiya sala 1996 an de li Bonê (Almaniy)bi dûşavên helbestên xwe re sermest dibe.

Husên M.Hebeş di destpêkê de tenê bi zimanê Erebî helbestên xwe dirêstin û gelek ji helbestên wî bi zimanê Erebî hatine weşandin,lê peyvên zimanê Kurdî herdem di giyan û dilê wî de mîna gul û darên zêtunê şiqin dibin.

Di berhevoka bi navnîşana (Darên Sermest)de(71) kurtehelbest çavên xwe li jînê vekirine,bi giştî di van helbestan de pirîskên geşdar vêdikevin û ew pir bi hêsanî û nayabdarî dihêlin ku darên bajar û navçeya xwe bi kelûgirî bipeyvin .

Di helbesta di bin navnîşana (komir) de ;dar bi nîştecî û cîhana xwe re pir bi zelalî dibêje:

Eger hemû pênûsên ku navê Azadiyê dinivisînin hatibin şikandin
Ezê şaxekê xwe bişewtînim
Û bikim komir û gêçnivîs!
Da ku azadîxwaz
Ethnic & Identity Groups
Li ser dîwarên cîhanê binivisînin
Bijî azadî. Rûpel: (36)

Dîsan ristevan Husên pir bi hestên şehreza ,dengê nalînên darên welatê xwe,darên gundê Şiyê û Çiyayê Kurmênc dibhîse ku ew dil û cegerên xwedanên xwe bi ava baranê ,bi ava kaniyên zelal avdide.

Tu pîr bûyî- -?
Li daran binêre !
Tenê bi hezkirin lê binêre
Tu dê keskatiya jiyana xwe geş bikî
Û Buhara dilê xwe jî ji nû ve ava bikî
Tenê li
daran binêre! Rûpel:(37)

Dar û janên daran giyanê helbestvan jî dêşînin û ew pir zû jî nalînên daran dibhîse,xemgînî û bêzariyên daran govdê wî dipeçinin,ew bi daran re stêrên bêzariyê dibarîne û ew di bin navnîşana (xemgîniya darekê)de dinivîse:

Darek xemgîn bû
Tozê pelên wê yên kesk û xweşik

Rûpel 13

Dûmahî : Hesen Xeyrî: Şaşiyeke Çarenûsaz an Welatfiroşî?

ya **Bedlîsê** ve girê didin, li hember vegotina fermî ya Tirkiyeyê ku vê yekê red dike. Lê mijar bi rastî ne piştrastkirina Kurdîbûna wî an redkirina wê ye. Ya girîngtir ew e ku ew bû yek ji stûnên Tirkiyeya nûjen, û di navenda wê qonaxê de jiya ku Komar ji gotara hevpariya bi Kurdan re derbasî tepeserkirina tevgerên wan û xurtkirina modela neteweyî ya navendperest bû. Heman pirs, bi şêwazeke nûjen, li ser **Hakan Fidan**, wezîrê karên derve yê Tirkiyeyê û serokê berê yê sazîya agahdariyê, jî tê kirin. Hin çavkaniyên belav rehên Kurdî yên wî bi **Wanê û eşîra Kurdî ya navdar a Hesnan** ve girê didin, lê ew ji aliyê ramyarî û nasnameyê ve bi temamî di nav sazîya Tirkiyeyê de cih digire û xwe wek beşek ji projeya serweriya Tirkiyeyê dibîne. Li vir jî divê em nekevin şaşiya berevajî: ku rehên malbatî bikin dadgeheke neteweyî, an kesek tenê ji ber ku rehên Kurdî hene û xwe Tirk dibîne, wek welatfiroş were navkirin.

Nasname ne gen e, û welatfiroşî ne pirsa xwînê ye.

Mirov dikare nasnameya xwe ya kesane bi awayê ku dixwaze hilbijêre, çi xwe Kurd, Tirk, Ereb an Fars bide nasîn. Lê mijar diguhere gava hilbijartin ji qada kesane derbasî **karê ramyarî û ewlekarî yê rêkxistî li dijî mafên gelekî ku mirov bi dîrokî ji derdora wî tê** dibe. Gava mirov dibe beşek ji saziyekê ku pirsa Kurdî nas dike, sed sal redkirin û pevçûnê dizane, û paşê bi zanebûn ji bo berdewamiya rêbazekê bixebite ku mafên neteweyî teng dike an pirsa gelekî vediguhezîne dosyayeke ewlekarî, em êdî li hember hilbijartineke kesane ya nasnameyê nînin; em li hember **helwesteke ramyarî ya bi mebest** in ku ew jî divê bibe mijara dadweriya dîrokî.
Li vir cudahî dibe bingehîn. Em dikarin Hesen Xeyrî berpirsiyarê biryareke giran bibînin, sadebûna wî ya ramyarî, baweriya wî bi Mustefa Kemal û nirxandina şaş a tiştê ku piştî Lozanê li benda Kurdan bû rexne bikin. Lê ma ji aliyê rewiştî û dîrokî ve rast e ku em wî di heman rêzê de bidin bi wan kesên ku **piştî eşkerekirina xapandinê** jiyan; serhildanên **Koçgirî, Şêx Seîd û Dersimê**, rêbazên redkirinê, koçberkirina bi zorê û rêgirtinên zimanî û neteweyî dîtin, pirsa Kurdî bi hemû aliyên wê nas kirin, û tevî vê yekê hilbijartin ku parastina navendperestiya serweriyê û ramyariyên wê li hember Kurdan bikin beşek ji projeya xwe ya ramyarî an ewlekarî?

Yê ku berî eşkerekirina xapandinê şaş bû, ne wek yê ku piştî eşkerekirina wê rastiya wê zanî û paşê hilbijart ku xizmeta wê bike.

Ev lêpirsîn ne tenê Hesen Xeyrî, Îsmet Înonu an Hakan Fidan vedigire; ew rasterast bi awayê ku tevgera Kurdî dîroka xwe dinivîse ve girêdayî ye. Em carinan zêde bi hêsanî leheng û welatfiroş çêdikin; barê qonaxeke temam dixin ser milê kesekî, û hevsengiya hêza **Brîtanya, Fransa, Îtalya û Tirkiyeyê**, û berjewendiyên hêzên navneteweyî yên ku herêm ji nû ve dabeş kirin, ji bîr dikin. Paşê heman dadwerî ji nifşekî bo nifşekî din dubare dikin, ta dibe beşek ji bîranîneke ku nabe li ser wê pirs bê kirin. Li aliyê din, nav, kesayetî û sazîyên ku bi dehsalan di redkirin û tepeserkirina Kurdan de beşdar bûn, her tim bi heman pîvana rewiştî nayên nirxandin.
Ev bi taybetî ew tişt e ku **tevgera çandî ya Kurdî** divê ji nû ve li ser raweste. Erka wê ne dubarekirina wan dadweriyên ku ramyarî afirandine ye, lê ji nû ve vekolîna wan e. Divê di navbera şaşî û sûcê de, di navbera xapîn û welatfiroşiyê de, di navbera poşmanî û israrê de, di navbera rehê neteweyî û helwesta ramyarî de cihêtiyê bike; di navbera kesê ku şaş bû bi baweriya ku xizmeta gelê xwe dike, û kesê ku şerê li dijî armanca gelê xwe kir projeyeke bi zanebûn û dirêjdem.
Ev nayê wê wateyê ku Hesen Xeyrî bê rexnekirin. Hin şaşiyên ramyarî encamên ku nikarin werin sererastkirin diafirînin, û hin ji wan bihayê xwe bi nifşan didin gelan. Mafê Kurdan e ku helwesta wî bi rexneyeke gelek tund binirxînin û bibêjin ku ew di kêliyeke ku dibe yek ji kêm kêliyên dîrokê bû ku pirsa Kurdî bû beşek ji rêkûpêkkirinên mezin ên navneteweyî, şaş bû.
Lê **hesabxwestin tiştek e, bi welatfiroşiyê dadbarkirin tiştek din e**. Dadmendiya dîrokî nayê wateya sivikkirina dadweriyê; ew wateya navkirina tiştan bi navê wan ê rast e.
Ji ber vê yekê, belkî dem hatiye ku em Hesen Xeyrî ji qutiya amade ya **«welatfiroş»** derxînin; ne ji bo ku wî bikin «leheng», lê ji bo ku wî li cihêkî dadmendtir û nêzîktirî rastiyê bidin: **Kurdek ku biryareke ramyarî ya çarenûsaz da û di wê de şaş bû; helwesta wî gotina Kemalî li Lozanê xurt kir, lê paşê ew bi heman pergala ku ji helwesta wî sûd wergirt rû bi rû ma, û di bin heman serweriyê de jiyana xwe winda kir.**
Welatfiroşî, heke em bixwazin ku peyv hîn nirxa xwe ya rewiştî û dîrokî biparêze, tiştek din e: ku mirov karesata gelê xwe bizane, encamên redkirina mafên wî bibîne, derfeta vegera ji helwesta xwe hebe, û paşê dîsa bi zanebûn û israr hilbijêre ku bibe beşek ji berdewamiya wê karesatê.
Ne her kesê ku şaş bû welatfiroş e, û ne her kesê ku rehên Kurdî hene ji Kurdan re dilsoz e. Di navbera van her duyan de dîrokeke temam heye ku pêdiviya wê bi hişeke rexneyî ye, ne bi dadgeheke dirûşman.
Ji nû ve nirxandina Hesen Xeyrî ne parastina kesekî ye ku sed sal berê mir; zêdetir bangek e ji bo ji nû ve nirxandina **pîvanên me bi xwe**: Em welatfiroş çawa çêdikin? Em leheng çawa çêdikin? Û li ser kîjan bingehê em kesayetiyên dîroka xwe dadbar dikin? Gelê ku dixwaze dîroka xwe bi hişmendî binivîse, têr nake ku navên dijminên xwe nas bike; divê wêrekî jî hebe ku dadweriyên xwe li ser zarokên xwe ji nû ve binirxîne.
Ji nû ve nivîsandina dîroka me ne afirandina rabirdûyekî nû ye, lê azadkirina rabirdûyê ji wan dadweriyên ku tevliheviya wê veşartine. Û belkî Hesen Xeyrî yek ji wan nimûneyan e ku ji her kesî zêdetir pêdiviya vê vegerê heye.

Dr. Mehmûd Abbas
Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê

22/8/2026

Hesen Xeyrî: Şaşiyeke Çarenûsaz an Welatfiroşî?

Bi dehsalan e ku di beşeke berfireh ji gotara ramyarî û çandî ya Kurdî de, nûnerê Kurd **Hesen Xeyrî Beg** wek yek ji wan kesan hatiye pêşkêşkirin ku navê wan bi **«welatfiroşiyê»** ve hatiye girêdan. Ewqas ku hemû jiyana wî di helwestekê de hatiye kurtkirin; helwestek ku wî di yek ji hestiyartirîn û tevlihevtirîn kêliyên dîroka Kurdî de girt. Bi derbasbûna demê, ev dadbarî bûye wek rastiyeke ku zêdetir tê dubarekirin ji ku tê vekolîn, wek ku biryar ji mêj ve hatiye dayîn û êdî dîrok mafê ji nû ve vekirina dosyayê tune be. Lê pirsa ku **tevgera çandî ya Kurdî** divê bi wêrekî bixe ber xwe, hêsantir û di heman demê de kûrtir e: **Ma her şaşiyeke ramyarî, her çiqas encamên wê karesatbar bin, dibe welatfiroşî? An di navbera kesê ku di nirxandina berjewendiya gelê xwe de şaş bûye û kesê ku bi zanebûn û bawerî hilbijartiye li dijî mafên wî gelî bixebite û vê rêyê bidomîne, cudahiyeke rewiştî û dîrokî heye?**

Ji bo hûrbînî, Hesen Xeyrî endamê şanda Tirkiyeyê ya ku li **Konferansa Lozanê** danûstandin dikir nebû. Ew nûnerê **Dersimê** di Meclisa Neteweyî ya Yekem a Tirkiyeyê de bû, û yek ji navdartirîn nûnerên Kurd bû ku helwesta wan hate bikaranîn da ku ji hêzên navneteweyî li Lozanê re bê gotin ku Kurd naxwazin ji Tirkan veqetin û amade ne di nav çarçoveyeke ramyarî ya hevpar de, di Tirkiyeya nû de, bi wan re bimînin. Li gor vegotin û belgeyên meclisê, bi daxwaza **Mustefa Kemal** ew bi cil û bergên Kurdî beşdar bû, li ser yekîtiya Kurd û Tirkan rawesta, û name û helwestên bi vê wateyê bo Lozanê hatin şandin. Ev yek di pratîkê de roleke girîng di xurtkirina gotina Tirkiyeyê li hember **Brîtanya, Fransa, Îtalya** û hêzên din de lîst; di demeke ku pirsa Kurdî hîn di rêkûpêkkirinên navneteweyî yên piştî Şerê Cîhanê yê Yekem û hilweşîna Împaratoriya Osmanî de hebû, û ramana Kurdistanê û mafê Kurdan ê diyarkirina çarenûsa xwe hîn bi temamî ji gotûbêja navneteweyî derneketibû. Îro, piştî sed sal ji encamên ku ji damezrandina Komara Tirkiyeyê û ramyariyên wê li hember Kurdan derketin, mafê me heye helwesta Hesen Xeyrî wek **şaşiyeke ramyarî û dîrokî ya gelek giran, û belkî şaşiyeke çarenûsaz ku bandora wê ji kesê xwe derbas bû û gihîşt gelêkî bi tevahî**, binirxînin. Sozên biratî û hevpariya Kurd û Tirkan ku di qonaxa destpêkê ya Mustefa Kemal de dihatin dayîn, piştî xurtbûna serweriya nû zû ji naveroka xwe vala bûn. Komar gav bi gav ber bi navendperestiya neteweyî ve çû; nasnameya Kurdî red kir, serhildanan tepeser kir, ziman û derbirîna neteweyî li ber astengiyan danî, û hewl da Kurdan di nav nasnameyeke tenê Tirkî de ji nû ve pênase bike.

Lê mezinahiya encamê, her çiqas dijwar be, bi tena xwe têr nake ku xweza kiryarê were diyarkirin. Li vir divê em di navbera **şaşiya çarenûsaz û welatfiroşiyê** de cihêtiyê bikin. Welatfiroşî, di wateya xwe ya kûr a rewiştî û ramyarî de, ne tenê nirxandineke şaş di kêliyeke aloz de ye. Ew li ser sê bingehan radiweste: **zanebûn, mebest û berdewamî**. Ku mirov bizane mafên gelê wî tên standin, paşê bi zanebûn ji bo redkirin an şikandina wan bixebite; encamên vê rêbazê bibîne û dîsa wê bidomîne; hêza serweriyê û sazîyên wê yên ramyarî û ewlekarî veguhezîne amûrek li dijî armanca gelê xwe — li vir em êdî li hember şaşiyekê nînin, lê li hember helwesteke bi zanebûn û domdar in. Lê heke kesek li ser formûleke ramyarî bet bike, bi baweriya ku, rast an şaş, ew dê ji gelê wî re di nav welatekî hevpar de hevpariyek biparêze, û paşê fêm bike ku ew bet valahî bû û soz veguherîn dijberê xwe, ev rewşek din e, her çiqas encamên şaşiya wî giran bin. Rewşa Hesen Xeyrî ji wê wêneya sade ya ku li ser wî hatiye avakirin gelek tevlihevtir e. Ew paşê li dijî hin kiryarên serweriyê rawesta, tiştê ku li **Koçgirî** qewimî rexne kir, ji pirsgirêkên herêma xwe parast, û piştî çend salan xwe li derveyî pergala ku wî di demekê de alîkar bû gotina wê li Lozanê xurt bibe dît. Di dawiyê de ew gihîşt **Dadgeha Serbixwebûnê** û di sala **1925an** de bi biryara wê jiyana wî hate bidawîkirin. Nakokiya herî tûj ew e ku cil û bergên Kurdî yên ku tê gotin wî bi daxwaza Mustefa Kemal lixwe kiribûn da ku li hundir û derve «yekîtiya Kurd û Tirkan» bê nîşandan, paşê di nav tiştên ku li dijî wî hatin bikaranîn de xuya bûn. Yanî ew kesê ku serweriyê rojekê wek **«Kurdek şahidê yekîtiyê»** pêdivî bi wî hebû, di qonaxeke din de bû kesê ku li dijî wî dadgeh hat avakirin, gava serwerî êdî pêdivî bi heman şahidî nedît.

Li ser vegotina belav ku dibêje wî ewqas poşman bû ku xwest gora wî li kêleka rê be da ku Kurd, her ku jê derbas dibin, li wî nalet bikin an tif bikin, divê bi hişyariyê were rawestan. Ev vegotineke belav e, lê ne ji wan vegotinan e ku divê dadweriyeke dîrokî ya temam li ser wê were avakirin, heta ku hûrgiliyên wê hîn nakok bin û bi belgeyeke qetî nehatibin piştrastkirin. Lê ev yek pêdiviya ji nû ve nirxandina Hesen Xeyrî lawaz nake; berevajî, wê xurtir dike. Ji ber ku dadmendî li hember wî ne divê xwe bispêre çîrokeke li ser **poşmaniyê. Bes e** em **hemû rêya jiyana wî bixwînin, ne ku wî bi rojek tenê ji jiyana wî dadbar bikin**. Heke bingehê poşmaniya wî û vegera wî ji helwesta xwe were piştrastkirin, poşmanî şaşiyê ji holê ranake û derfeteke winda venagerîne; lê xweza dadweriya rewiştî li ser wî diguhere. Yê ku şaşiya xwe dibîne û bi encamên wê re rû bi rû dimîne, ne wek yê ku hemû karesatê dibîne û dîsa hilbijêre di berdewamkirina wê de beşdar bibe.

Li vir di bîranîna me ya ramyarî de nakokiyeke hîn mezintir xuya dibe. Heke peyva **«welatfiroşî»** bi vê hêsaniyê li ser Hesen Xeyrî tê bikaranîn, em ê çawa li kesayetiyên ku ji reh an derdorên Kurdî hatine, an hin vegotinên dîrokî wan bi van derdoran ve girê didin, binêrin; kesayetiyên ku postên xwe yên ramyarî, leşkerî û ewlekarî dan xizmeta serweriyeke ku hebûna Kurdî red kir an li dijî tevgera wan xebitî? Li vir navê **Îsmet Înonu** derdikeve pêş; kesê duyem di damezrandina Komara Tirkiyeyê piştî Mustefa Kemal de, yek ji girîngtirîn serdar û rayedarên ramyarî yên wê, û paşê serokê Tirkiyeyê piştî Atatürk. Li ser rehên malbata wî ji aliyê bav ve vegotinên cuda hene; hin ji wan bi derdoreke **Kurdî**

Rûpel 15

Elî Şemdîn: Derfetên Dîrokî li Benda Belavbûyan Namînin

Derfetên Dîrokî li Benda Belavbûyan Namînin

Piştî ku di 25'ê Tebaxa 2026'an de, bi fermî ji aliyê berêz Mezlûm Ebdî ve hate ragihandin, ku êdî erkê Hêzên Sûriye Demoqrat (HSD), bi dawî hat, û sazî û dezgehên Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin hilweşandin, û derbazî nav dezgeh û saziyên dewletê bûn û yekgirtin, yekser gengeşe û danûsitandin li ser giringiya vê gavê û bandora wê li ser herdû astên nîştimanî û kurdî xurtir bû, û nerînên li ser vê gavê, ber bi çend aliyan ve hatin dabeşkirin, û giringtirîn alî ji wan aliyan ev bûn: Aliyekî ji wan bi eşkere dijberî vê gavê rawestiya, û ew ragihandin wek destberdan ji mafên netewî yên gelê Kurd li Sûriyê di hijmart, û wek sazeşkirinê li ser hebûna wî didît, ku dewem mezintirîn neteweye li Sîriye û di hemberî vî aliyî de, aliyekî din jî hebû ku ew Pêvajoya Tevlîbûn û yekgirtinê wek pêngaveke pozetîf û erênî didît, ku bi saya vê pêngavê agirê şerê navxweyî hate vemirandin, ku nêzîk bû hatibane vêxistin bi sedema rûbirûbûnên çekdarî di herdû Taxên Kurdî de li Bajarê Helebê, Şêx Meqsûd û Eşrefiyê, û pêta vî agirî gihiştibû heta sînorên deverên kurdî li Hesekê û Kobanê, û xwediyên vê nerînê dibînin ku Pêvajoya Tevlîbûnê, tevî ku nikarîbû Pirsa Kurdî li Sûriyê ber bi çareseriyê ve bibe ku li gorî hêvî û daxwaziyên gelê Kurd be, lê belê vê pêvajoyê dergeh li ber şerekî navxweyî girt, û derfet li ber qonaxeke nû ji xebata siyasî ya tevgera Kurdî li Sûriyê vekir, ku dibe li ser were avakirin, û xebata siyasî were berdewam kirin ber bi destnîşankirina Mafên Netewî yên gelê Kurd di destûra Sûrî ya nû de, bi awayekî ku li gor xebata wî û qurbaniyên wî yên giranbiha bin û ev nêrîn bi xwe nûneratiya piraniya Raya Giştî ya Kurdî li Sûriyê dike û di nav van gengeşe û danûstandinên di navbera her dû aliyan de, ku hin caran sînorê xwe yên babetî derbaz dikirin, û ji çarçoveya (Nêrîn û nêrînên din) derdiketin,lewma hindek kesên keysperest ev helûmercên tije nakokî, li dijî tevgera Kurdî li Sûriyê û li dijî serkirdayetiya wê bi dujminayetî bi kar di anîn, û daxwaze hilweşandina vê tevgerê dikirin û doza li darxistina kongireyekî dikirin li Şamê, bi armanca ku karibin tevgereke nû li gorî bejn û bala xwe damezrînin û dengoyek belav dikirin ku pirsgirêka Kurd li Sûriyê miriye û nemaye.

Bê goman Pirsa Kurd li Sûriyê ava nebûya bi damezrandina partiyeke siyasî yan çarçeweke leşkerî re, û ew namirê jî bi hilweşandina wan partî û çarçewan,ji ber ku ew pirsa miletekiye, û qet nayê bi dawîkirin û bi piştguhxistin,bi riya bexşîna hin destkeftên îdarî û leşkerî, û bi riya hin kursiyên perlemanî,lê ew pirs tê çareserkirin bi tenê bi riyên demoqratî û dadperwerî.

Bi rastî, ev ezmûna leşkerî û îdarî ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî ji şaşî û kêmasiyan dûr nemaye, û ev yek divê, çi zû be

yan dereng, were nirxandin û rexnekirin,lê ya giringtir ewe ku divê îro roj em bi berpirsiyartî li ser erkên serekî yên ku li pêşiya tevgera Kurdî hatine danîn bisekinin,û xwe amade bikin ji bo qonaxa piştî pêvajoya tevlîbûnê û hilweşandina HSDê û dezgeh û saziyên Rêveberiya Xweser.

Her wiha, bi dil û can bixebitin daku sûdê ji wan pêngavên erênî ku Hikûmeta Demkî li Şamê ber bi Kurdan ve avêtine werbigirin, û di pêşiya wan gavan de, mersûmê (13)'an û di vî warî de, divê encamên konfiransê 26'ê Nîsana 2025'an, bilez werin aktîvkirin û ji Rewayetiya Neteweyî ya wan encaman were destpêkirin, û bi yek destî ber bi avakirina sîwaneke siyasî ya hevbeş ve biçin, ku ev sîwan hemî aliyên tevgera Kurdî li Sûriyê di bin siya xwe de kom bike û bi civîne, ji partiyên siyasî û rêxistin û saziyên kultûrî û civakî yên Kurdî, bi bê dûrxistin û cudayî,yan jî ev derfetên dîrokî li benda belavbûyan Namînin

PUKMEDIA

LI EFRÎNÊ KAMPANYAYA “MALA MIN MAFÊ MIN E” HAT DESTPÊKIRIN

Çalakvan û rojnamevanên li Efrînê, bi armanca vegerandina mal û milkên şêniyên resen ên ku hatine desteserkirin, kampanyayek bi navê “Mala min mafê min e” dan destpêkirin

LI EFRÎNÊ KAMPANYAYA “MALA MIN MAFÊ MIN E” HAT DESTPÊKIRIN

Çalakvan û rojnamevanên li Efrînê, bi armanca vegerandina mal û milkên şêniyên resen ên ku hatine desteserkirin, li ser medyaya dîjîtal kampanyayek bi navê “Mala min mafê min e” dan destpêkirin. Kampanya hewldanek e ji bo zextkirin û lezkirina rêkarên vegerandina malan bo xwediyên wan ên qanûnî.
Daxuyaniyên Sereke û Mijarên Balkêş

Armanca Kampanyayê: *Ev kampanya ku di 16ê Îlonê de dest pê kiriye, dixwaze dosyeya desteserkirina malan bixe rojeva raya giştî, daxwaza bidawîanîna van binpêkirinan bike û pişt-giriyê bide şêniyên resen daku mal û milkên xwe vegerînin.*
Berfirehiya Pirsgirêkê: Li gorî zanyariyên rojnamevanên herêmê, derbarê desteserkirina malan de rojane bi dehan gazinc û gilî ji aliyê şêniyên resen ve tên tomarkirin, lê tevî vê yekê jî hîn bi sedan mal di destê nişтecihan de mane.

Beşdarbûna Welatiyan û Tomarkirin: *Kampanya bi haştagên "# "بيتي_حقيû “Mala min mafê min e” tê birêvebirin. Ji roja yekem ve bi sedan kes tev li kampanyayê bûne û wekî belge, wêneyên mal û zeviyên xwe yên ku ji destê wan hatine derxistin, li ser torên civakî weşandine. Sazkerên kampanyayê bang li hemû aliyên piştgir dikin ku beşdarî vê tevgerê bibin.*
Ji Bo Agahdariya We

Destpêkirina vê kampanyaya sivîl û dîjîtal li Efrînê, bertekeke rasterast a şêniyên herêmê ye li hemberî binpêkirina berdewam a mafên mulkiyetê û hewldanên guhertina demografîk. Ev liv û tevgereke girîng e ji bo belgekirina desteserkirina mal û milkên welatiyên Kurd ên resen ji aliyê nişтecihên hawirdekirî ve. Her wiha, ev kampanya nîşan dide ku tevî dijwariya şert û mercên ewlehiyê yên li herêmê, xelkê Efrînê ji bo bidestxistina mafên xwe yên rewa û rawestandina desteserkirina samanên xwe, hewldanên xwe yên medyayî û sivîl berfirehtir dikin.

Dûmahiya Dengê Pêşerû

Bê goman ev bijarde ne baştirîn nimûne ye, yan jî bê wêneye li cem Miletê Kurd û Tevgera wî ya Siyasî, her wiha ne di astê wan qurbaniyên giranbûha de bû, ku van hêzên nîştimanî yên bi ezmûn pêşkêş kiribûn ji bo nehiştina terorê û parastina bêtir ji yek li ser siyan ji xaka Sûriyê ji serberdayetî û têkçûna
ewlehî û aramiya ***îdarî,*** *her wiha bê guman ev ezmûn ji şaşî û kêmasiyan jî ne dûr bû, û derfet hebûn ku gelek ji wan şaşiyan çareser bikin, meger aliyekî bi xwe takrewî nekiribane, û aliyên Kurdî yên dinê dûrnexistibane.*

Eger em pîvanê bikin li gor pirensîpê (Bistîne, û bixwaze), ji xwe wê bê sûd be ku em giftûgoyan ber bi bazinekî Bêzentî û nezok ve bajon, yan jî em xwe mijûl bikin bi çendî ev ezmûn serkeftî bû yan na? û çi destkeftî li ser erdê hatine bidestxistin piştî bi dawîhatina vê Piroseya Tevlîbûnê di nav dezgehên dewletê de? Ji ber ku ev destkeftiyên ku îro hatine bidestxistin di warê mafê zimanz û çanda Kurdî de, her wiha bidestxistina çend postên îdarî û leşkerî, ku gelekî biçûkin jî, lê ew destkeftî her weke gavên pozetîv têne hijmartin, û derfet heye li ser wan destkeftiyan were avakirin, û berdewam bibin li ser daxwazkirina mafên siyasî û destûrî yên zêdetir, ku bibe dergehek ji bo ku Miletê Kurd bibe hevbeşekî rasteqîne di avakirina Dewleta Sûrî ya nû de,û ji bo ku destûra Sûrî hebûna wî wek diwem mezintirîn netewe li Sûriyê danpêbide û erê bike.

Divê were bi bîrxistin, ku dergehê serekî ji bo bidestxistina mafên Kurdî ewe ku bi yekcarî dûr bikevin ji takrewiyê di meydana siyasî ya Kurdî de, û li şûna takrewiyê, vegerin ser derencamên konfiransê (26 Nîsana 2025), û li ser bingiha van derencaman ber bi avakirina lêvegereke siyasî Kurdî berfireh biçin, ku bikaribe rêveberiya xebata siyasî di qonaxa nû de li stûyî xwe bigire ji bo bidestxistina mafên netewî yên Miletê Kurd, ku ew maf li gor astê qurbaniyên wî yên dîrokî bin, ku pêşkêş kirine û hîna jî pêşkêş dikin ji bo pêşxistina welatê Sûriyê û parastina ewlehî û aramiya wî.

Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Bi giyan û vîna Rojnameya Kurdistan Em xebata xwe dikin

Bi helkefta cejna Rojnamegeriya Kurdî Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû cejna hemû Rojname , Kovar , Tv , Malperên Eliktironî û cejna tevahî medyekar û rojnamevanên Kurdistanê pîroz dike û serkeftinê ji xebata Rojnamegeriya Kurdî re dixwaze.

Pêşverû
Siyasî . Çandî . Giştî

Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Rojnameya Pêşverû Dengê miletê kurd e
Dengê Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ye

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Giştî

Rojnameyeke Mehaneye ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar (104) Êlûn 2026 Z - 2638 K

Dengê Pêşverû

Divê Lêvegerek were avakirin

Tiştekî çavrêkirî bû, dema ku Cenral Mezlûm Ebdî di (25 Tabaxa 2026)'an de, bi dawî hatina erkê Hêzên Sûriye ya Demoqrat (HSD), û hilweşandina dezgehên îdarî yên girêdayî bi wan ve li Rojhilata Feratê,ragihand û eşkere kir, ew hêz û dezgihên ku berî deh salan hatibûn damezrandin bi alîkariya Hevbendiya Nav-dewletî li dijî Rêxistina Dewleta Îslamî (DA'IŞ), û ji bo ku nehêlin ew rêxistina tûndrew wê valahiya ewlehî û îdarî dabigire, ew valahiya ku di dema xwevekişandina rêjîma Beşar Esed de hatibû peydakirin di wan navçeyan de,çimkî di encamê imzekirina rêkeftina (29 Kanuna Diwem 2026), di navbera fermandarê Hêzên Sûriye ya Demoqrat (Ceneral Mezlûm Ebdî), û serokê Sûriya yê demkî (Ehmed Şer'i)'de, ew şer hatibû sekinandin, ku di navbera herdû aliyan de destpêkiribû bi sedema buyerên herdû taxên Kurdî li taxên (Eşrefiyê, û Şêx Meqsûd) yên bajarê Helebê .

Her wiha ji naveroka vê rêkeftinê diyar bû ku pêşeroja (HSD), û dezgihên wê yên Îdarî û Leşkerî, îro be yan sibe, her wê werin hilweşandin û ber bi tevlîbûnê ve biçin û wê bibin beşek ji peykerê dewleta Sûrî ya nû, yan jî wê rewş dîsan vegere qonaxa şer, ku dilsozên pêşeroja Sûriye ev yek tu caran nexwestine û naxwazin jî,lewma asayî bû ku di encamê Piroseya Tevlîbûnê de, ya ku bi sistî birêve diçû, Mezlûm Ebdî li Koşka Gel li Şamê ragihîne û bibêje:Êdî erkê Hêzên Sûriye ya Demoqrat bi dawî hat, û dezgehên wê yên leşkerî û îdarî hilweşiyan û neman, û hatin veguheztin ji bo qonaxeke nû ji tevlîbûnê di nav dezgehên Dewleta Sûriyê **de.**

Rûpel 19

Sed silav li giyanê we

Bijî Zimanê Kurdî



Rojnameya Pêşverû

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Giştî

Ev Rojname Rojnameya we ye
Ev Deng û Hawara we ye
Zengîn bikin bi gotarên xwe
Ev xewn û Hêviya me ye

Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook التقدمي عفرين